Royal College of Anaesthetists

Bûjenên benckir –
metirsî û bandorên alîkî

# Kulbûna gewriyê

## Derbarê vê belavokê

Ev belavok li ser nexweşiya **kulbûna gewriyê** ye ku **piştî benckira gelemperî** derdikeve. Ev bandorek alîkî ye ku dibe piştî benckira gelemperî bê serê mirov. Ev belavok, sedemên kulbûna gewriyê û tiştên di derbarê wê de dikarin bên kirin rave dike.

Benckirên gelemperî derman in ku mirov dixe rewşekê ku dişibe xeweke giran. Ew ji bo hin neştergerîyan û prosedûran girîng in. Dema benckira gelemperî li dar e, mirov bêhiş e û tiştekî hîs nake.

Hûn dikarin li ser malpera me derbarê cureyên bûjenên benckiran bixwînin, ku bi zimanên cuda li vir berdest in: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.


## Hesteke çawa bi mirov re çê dike?

- Dibe ku hûn nerehetiyekê an jî eşeke girantir di gewriya xwe de hîs bikin.
- Kulbûna gewriyê, bi gelemperî bi qasî 24-48 saetan didome.
- Dibe ku denge we bikeve.
- Dibe ku gewriya we gelekî zuha bibe.

## Çiqas pêkan e ku ev yek biqewime?

Ihtîmala qewimîna vê rewşê girêdayî amûran e ku benckirzana/ê we bi kar tîne.

**Ji her 100 kesî**



**Dora 20-40 kes dît** **Dora 60-80 nedît**

Ev hejmar ji xebatên lêkolînan hatine wergirtin. Hûn dikarin li ser malpera me bibînin bê me ev hejmar ji ku wergirtine: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/evidence.

## Çi dibe sedema kulbûna gewriyê piştî benckirinê?

Hin gaz û dermanên benckirinê dikarin gewriya we zuha bikin.

Hin amûrên ku benckirzan di dema pêkanîna benckirina giştî bi kar tînin dikarin gewriya we kul bikin.

Di dema benckira gelemperî de, masûlkeyên laşê we rehet dibin, tevî yên li dora qirik û sînga we. Ev dikare rêjeya hewaya ku diçe pişika we kêm bike.

Ji bo berdewamiya derbasbûna oksîjenê ber bi pişika we ve misoger bike, benckirzan dibe ku lûleyeke bêhngirtinê di gewriya we de bi cîh bike da ku rêhewaya we vekirî bimîne. Ew, vê yekê bi giştî piştî ku hûn bêhiş dibin bi cîh tînin.

Lûle yan jî rûpoşên ku benckar li dema bêhişbûna we bi kar tîne dikarin gewriya we kul bikin, ji ber ku:

- dema hatin bi cîh kirin an derxistin, ew dikarin gewriya we kul bikin
- hin ji wan dinepixin û dema dinepixin dikarin zext li gewriya bikin. Ev dibe ku bibe sedema nerehetiyê.

Agahiyên zêdetir di derheqê rêhewa û bêhnkişandina we ya di dema benckirinê de bi zimanên cuda li ser malpera me berdest in:
www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

## Çi dikare pêşiya we bigire?

Hûn dikarin dermanên sivikkirina êşê wekî ibuprofen an jî paracetamol bixwin. Hûn dikarin bi Bijîşkê Giştî yan jî dermansazê xwe bişêwirin bê kîjan dermana sivikkirina êşê ji bo we herî baş e. Nexweşxane jî dibe hin dermanên sivikkirina êşê bidin we berî ku hûn herin mala xwe.

## Kengî alîkarî divê?

- Heke piştî benckirinê bi hefteyek êşa we girantir bibe û hûn bi rehetî nikaribin daqurtînin, divê hûn Bijîşkê Giştî yan peristara/ê xwe bibînin an jî şîretan ji dermansazek werbigirin.
- Kengî be jî, heke hûn bi zehmetiyê hilmê bistînin an jî hûn xwîn bikuxin, divê hûn bi lezgînî ji bo agahiyên zêdetir bi Bijîşkê Giştî yan jî bi benckirzan re têkevin têkiliyê.

## Destjêkişandin

Em gelek hewl didin ku agahiyên di vê belavokê de rast û nûjen bimînin, lê em nikarin vê yekê dabîn bikin. Em ne li bendê ne ku ev agahiyên giştî, cewaba hemî pirsên we yan jî çareseriya hemû tiştên ku ji we re girîng in bidin. Divê hûn vê belavokê wekî rêber bikar bînin û bijareyên xwe û her xemên xwe bi tîma xwe ya bijîjkî re bipeyivin. Divê ev belavok bi serê xwe wekî şîret neyê hesibandin. Ev belavok ji bo armancek bazirganî yan karsaziyê nayê bikar anîn. Ji bo destjêkişandin a bi temamî li vir binêrin: **www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji**.

Werger bi giştî ji aliyê civata wergeran a Translators without Borders (Wergerên Bêsînor) hatiye wergerandin. Kalîteyên van wergeran tên kontrol kirin da ku bi qasî ku dibe rast bin, lê metirsiya çewt wergerandin û çewt şîrovekirina hin agahiyan dibe ku çebibe.

# Ji me re bêjin ka bê hûn çi difikirin

Em pêşwaziya pêşniyarên ji bo baştirkirina vê belavokê dikin.

Ger têbînîyên we hene ku hûn dixwazin pêşkêş bikin, ji kerema xwe bi riya e-mail bişînin li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

**Royal College of Anaesthetists**
Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG

# www.rcoa.ac.uk

Çapa Şeşemîn, Mijdara 2024
Ev belavok wê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nirxandin.

**© 2024 Royal College of Anaesthesists**
Dibe ku ev belavok ji bo çêkirina bûjena agahiya nexweşan were kopîkirin. Ji kerema we, çavkanîya orîjînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema we bi me re têkilîyê danin.